

## Çavê gelê Kurd Bi girtina têkoşerên wî naşike!!

Rêberê Silvî

Sibeha roja sêşemê 20.10.2009an, dezgeha asayîşa rêzanî ya dewletê li bajarokê Amûdê, dest danî ser têkoşer û xebatkarê Kurd ê navdar **Behcetê Begê** (Bavê Şino), û ew şandiye şaxa Hîsiçê, û ta vê gavê, rewş û çarenûsa wî ne diyar e.



Birêz **Bavê Şino**, ku bi temenê xwe derdora şêst salî ye, wî piraniya salên xwe di kar û xebata kurdewariyê de borandiye û ji bo doza gelê xwe ya dadmend û rewa xebateke bê hempa kiriye, weke kesayetiyeke rastgo, wêrek û dilsoz di nav xelkê de hatiye naskirin.

Ji roja ku wî dest bi xebata rêzanî kiriye, her û her wî berjewendiya welatê xwe Sûriyê û ya gelê wê bi tevayî parastiyê, xebateke îjdlî û bê dudilî ji bo parastin û pêşvebirina biratiya Kurd û Ereban pêşkêş kiriye. Di heman demê de, wî li zindan û li derveyî zindanê jî, pêdariyeke berbiçav li hemberî siyaseta şoven a karbidestên dewletê û pîlanên wê yên nijadperest ên ne mirovane kirye û ji xelkên xwe re bûye nimûneyeke balkêş. Çavên wî ji çoyê dewletê ne şikestiyê û wî destberdayî li derd û kulên gelê xwe temaşe ne kiriye û piştî xwe ne daye êşekên wî. Lê belê, di her roleke erênî de, di warê geşkirina xebata demokratîk a aştiyane de hebû ye.

Birêz **Bavê Şino**, mirovekî xwedî bawerî û

geşbîn e. Tevî rewşa awarte ya tevgera me ya netewî, rojekê ew ji kar û xebata kurdewariyê bê hêvî ne bûye, Herdem, di rojên reş û tariyê de, di rojên teng û çavsoyîyê de, wî pêdarî kiriye, di nav keç û xortên Kurdan de, moralên wan bilind kiriye, hêvî û baweriya bi dozê di dil û hişê wan de çandiye û berî her kesî, wî qurbanî daniye. Di vî warî de, tê bîra min wî di civateke rewşenbîran de, bi vê wateyê gotibû: " Di jiyana xwe de, rojêke bi tenê jî ez li xebata xwe poşman nebûme, ji kar û xebata kurdewariyê bê hêvî nebûme, û min ji hevalekî xwe re gotiye, hevalo, eger ez mirim, û rojekê hûn hatin ser gora min û ji bo vê doza pîroz karekî ji min bixwazin, ezê serê xwe hildim, axa gorê biqelêşim û rabim ser piyên xwe û wî karî ji bo gelê xwe bikim!!"

Girtin û binçavkirina mirovên mîna têkoşer û xebatkar **Bavê Şino**, pîrsa Kurdî li Sûriyê çareser nake, ne tenê wî, ew çavên gelê me yê qehreman jî naşikîne, û vîna wî ji bo misogerkirina mafên wî yên netewî naçilmisîne.

Di baweriya min de, girtina birêz **Bavê Şino** û hemî xebatkarên Kurd û niştimanperwerên Sûriyê, nakeve rajeya bilind a welatê me. Giringe ku karbidestên dewletê li xwe vegezin, çavên xwe li guhertinên dunyayê vekin, ka bê çî li derdora wan dibe û çî nabe, dewletên dinê bi çî awî têkiliyê bi gelên xwe re dikin, daku ew jî dev ji kiryarên xwe berdin, lêborînê ji gelê xwe bixwazin û bi diyalogê pîrsan çareser bikin.

Hêviya min ew e ku birêz **Bavê Şino** digel hemî girtiyên siyasî yên Sûriyê bêtin berdan û ew hemî jiyana xwe ya normal bijîn.

Heleb 25.10.2009 Z